

Her diçe Xizanî li deverên Kurdî pirtir dibe!

Rêberê Silivî

Dema ku **Dilo** derbasî nivîsgeha min bû, ez bi tenê bûm. Piştî pêşkêşkirina rêz û silavan, bêdeng ew li hemberî min rûnişt. **Dilo**, dostekî min î navser e, bi temenê xwe 43 salî ye, bavê sê kur û du keçan e, ew ji rûniştvanên herêma Cizîrê ye û karê wî avakirina avahiyên e, di karê xwe de hostekî bi nav û deng e, zîrek, jêhatî û dilsoz e.

Wê rojê, ew pir xemgîn bû, melûl, hejar û baskîkestî bû, te digot qey wî hemî barê dinyayê li ser milên xwe hilgirtiye!! Xizanî û perîşaniya tevaya cîhanê di awirên wan çavên wî yên ku di qoqê serî de kûr çûbûn dihate dîtîn. Tiliyên destên xwe yên gij û zivr dirêjî çixarakê kir, agir berdayê, dû û dûman bi ser serê xwe xist û kûr diponijî, ew di derya xem û xeyalan de noq bûbû!!

Bi dengê bilind min jê pirsî: Ha hevalo te xêr e, çi hatiye serê te tu ewqas xemgîn û bi keser î?. Ji dengê min ew veceniqî, bi dengê zîz li min veqerand û got:

" Ma çawa ezê xemgîn nebim birayê min!! Ma çawa ezê xweliyê li serê xwe nekim! Bi navê xwedê yê şêrîn, ji ber bê kariyê ez bê hiş û bê sewdan im, vir de diçim, wir de dibezim, tu kar bi destê min nakeve, îde ji derdê destengiya malwêran, ez ji kufletê

mala xwe şerm û fihêt dikim !!. Bawer bike, eve derdora 25 salan e ku ez vî karî dikim, tucarî ez ne ketime rewşeke wiha xirab û kambax. Bi rastî, ez nema dizanim çi bikim, bi kû ve herim û rê li ber min winda bûne.

Carê, hê beriya ku min avahiyek kuta bikira, yek yan dido li benda min bûn, karê min pir bû, ez di ber re ne digiham, lê îro, dîtina karekî ji min re bûye xewn!! Beriya demekê, ji bo dîtina karekî ez çûbûme bajarê Şamê, kar li wir hebû, lê ew pir erzan bû, pereyên wî têra nanûzikê jî ne dikirin!! Rabû ez vegeyriyam, ma ez çawa bikim biracan?. Ev cîhana fireh a mezin a bê sînor li serê min belengazê xwedê teng bûye..!!"

Xwendevanên birêz, ev ne xewn, ne çîrok, çîvanok û ne jî xeyal e, ne jî ew ji afirandina hişê min e, da ku ez dilê we bi rewşa belengaz û perîşanan bişewitînim, lê belê, ew wênayek ji jiyana gelê me ya rojane ya rasteqîn e.

Bi rastî, ji ber projeyên çewsandin û birçîkirina gelê me yê Kurd, digel ziwabûna erd û ezman, rewşeke pir aloz di deverên Kurdî de rû daye, xizanî, D.R. (11)



*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*